## Azadî çiye?

»»» R:9



## Revîna ji heqîqetan

»»» R:2

## Gera zeman û waneya Kurdan

»»» R:3

## Şorişek civakî û jêketên siyasî

»»» R:5

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (446) 21-05-2023Buha (1000) Tûmen

# Benkê îdamê dê bibe sedemê mergê dîktator



Deshilat bi zorê nayê parastin, belkî hindî zuilm û zordarî zêde be, ev deshilat zêdetir dikeve ber kerb û kîna xelkê û sernixûniya vê bileztir dibe.

Bi zorî parastina deshilatê ji aliyê dîktatoran ve, weke vê ye ku kesek bixwaze mistek xîz li nava destê xwe de bigre ku nerije, çiqasî bo parastina xîz zêdetir mista xwe bîne hev û bişdîne, evqas zêdetir xîz di nava dest û tilyên wî de dirije.

Rejîma mirovkuj û dîktator a Axundî jî di deve devê sernixûniya xwe de dixwaze bi zêde kirina girtin û îşkence û îdaman deshilata xwe biparêze.

Rejîma dijî mirov a Îslamî, dixwaze bi berfirehtirkirina pêla êdam û sêdarê û rijandina xwîna xelkê bêzarbûyî yê Îranê, hem tirs û xof û wehşetê bixe nava xelkê de, hem bi curekê tolê ji xelkê serhildayî û azadîxwaz ên Îranê bistîne.

Ev armancên rejîmê jî bilqên ser avê ne û ne tenê nikare bi îdamkirinan, xelkê çavtirsandî bike, belkî xelk zêdetir mukum dibin bona sernixûniya vê dîktatoriyê , herwisa hekî rejîma dîktator jêvebe ku şoreş dawî pêhatiye û şeqam çol bûne, û dixwaze tola rojên şoreşê ku kela dîktatoriyê xistibûne lerzê, ev cinayet û îdamanên han dikarin dîsan xelkê azadîxwaz û şoreşvan bikişîne ser şeqam û bi be guma vê carê dê dawî derkevtin û hemase be ji bona sernixûniya dîktatoriya wilayeta Feqîh.

Rejîmê bo wan 2 armancên xwe yên dijî mirovî anku çavtirsandin û tolhildan ji xelkê, maşîna îdama xwe zêdetir li ser xortên Netewên bê maf ên weke Kurd û Ereb û Belûç xistiye kar.

Herwisa rejîm bi armanca peçavtina cinayetên xwe û kêmrengkirina wan îdaman, bi navê Qesas û Qaçaxa madeyên hişber û …hwd.

Zêdetir xelkê îdam dike û ji bona xwe parastina givaşên navnetewî xortên wan netewan bi navê Qaçaxçî û Qesas îdam dike, ger hemî cîhan jî nezane , yan li hember cinayetên rejîmê de bêdeng bin, aliyê kêm Netewên Kurd û Belûç û Ereb baş vê yekê dizanin ku kuştin û girin û êdam a heçî xortekî wan netewanê îca li jêr heçî navekê be yan bi her sûçekê be, tenê û tenê qetliam û jînosayd û jinavbirina mirovên Kurd û Belûç û Ereb e.

Gelên seranserî Îranê tenê dikarin bi yekîtî û yekrêziya xwe û berdewamiya şoreşê pêşya wan cinayet û mirovkujiya rejîmê bigrin.

# Revîna ji heqîqetan



**N: Kerîm Perwîzî**
**W: Hesen Mukerem**

Pêş li serdema pêşkevtina hizrî û dewrana kupika Yûnanê de, dewrana efsaney di nivîsên wan de heye ku cîhana vê pir li remz û raz û nehînî ne, ku wateyên jiyan û cîhana wan di hêmayên wan de nîşan daye û bo her canliber û çemkekê hêmayek diyar û bo piraniya diyardeyan, Xwedayeke taybet hebûye.

Yekek li Xwedayên herî kevin yê Yûnan "Erbûs"e! Erbûs Xwedayê tarîtiyê an bibêjin ku ji wan canliberan e ku digel xwe tarîtiyê dibe bo hemû cihî û pêka efsaneyên Yûnaniyan hemû demî digel Xwedayeke din yê xirabkariyê bi navê Naykes, hewl dide li ser cîhanê de zal bike, lê hemû rojê keçka wî lê têk dide û ronahiya rojê dixiste ser cîhanê û tarîtî nedima. Piştî heyamek di vî karî de, ji aliyê Xwedayê Xwedayan ve bo binerdê hatiye dûr xistin!

Di bin erdê de jî Erbûs hewl daye ku tarîtiyê li ser cehenemê de zal bike û bixwe bibe bi xwediyê ceheneme, an cîhana di bin erdê de wir Hadês ku xwedayê bin erdê bû, haydarî wî bû û ev şikest da û ev bo Tartarêsê dûr xist, ku li cehenemê jî dûrtir û nexweştir bû û her ji ber vê yekê Tartarês li cheneme tarîtir bû bi çûna Erbûs bo wir!

Erbûs ev Xwedayê tarîtiyê ye ku di efsaneyên pir kevin yên Yûnaniyan de yê serdema nediyaran e ku hertim tarîtî aniye û her dema ku xwastiye karekê encam bide ku xrabtir bike, li ronahiyê dûrtir kevtiye û bo dûrtirîn kûrahiya cîhanê û hebûnê hatiye dûrxistin!

Erbûsa vî zemanî Komara Wilayeta Feqîh e ku her dema ku hewl daye ku gendelî û xirabiyekê dapoşe, tawaneke din û xirabiyek din encam dide û di heqîqîtê ji tirsa revîna ji roja heqîqetê pena xwe dibe bo çewtekarî û kirîzên din û bo xwe veşartin û revînê dixwaze tawanên xwe veşêre!

Roja Pêcşemî 21`ê Banemerê (11`ê Gulana 2023`an) li Barzana cihê serhildana çendîn şoreşên Kurdayetiyê, rêûresimeke mezin û pir şan bona vekirina Yadgeha Barzanî birê ve çû, di vê rêûresmê de ku bi destê rêzdar Mesû`id Barzanî Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê û Serokê berê yê Herêma Kurdistanê hat vekirin, pir heyetên dîplomatîk yên welatan û aliyê siyasî amadebûn û yadgehek pir binirx û cihê bal danê hat vekirin. Yekek ji girîngiyên vê rêûresimê pişkdarbûna aliyên Kurdî yên hemû cihên Kurdistanê bû û herwisa yek ji xalên girîng yên vê rêûresimê peyama rêzdar Mesû`id Barzanî bo destpêkirina diyalogê li pêxema çareserkirina pirsgirêkên aliyên siyasî yên Herêma Kurdistanê bû. Di rastiyê de pişikdarbûna aliyên siyasî yên Kurdî li hemû parçan û herwisa peyama taybet a Mesû`id Barzanî û çareseriya pirsgirêkên pareke Kurdistanê xala girînga vê rêûresimê bû, ku peyama yekbûn û bihevre bûnê dide.

Heyeta Partiya Demorkat bi serpereştiya rêzdar Mistefa Hicrî ku bi vexwandina fermî wir amade bûn û hertim piştevaniya bihevre bûna hemû parçên Kurdistanê û rêya diyalog û çareseriya arîşeyan bûye, hem bi pişikdariya wan bi hevpiştî û rêza xwe bo şoreşa Kurd li Kurdistana Îraqê nîşan da û hem di hevpeyvîn digel medyayan de bas ji girîngiya rêkarên diyalogê bo çareseriya arîşeyan di Herêma Kurdistanê de kir.

Di vê rêûresimê de ku yada mirovekî xebatkar tê kirin û bandoreke xuya di dîroka navçê de hebûye û rêûresimeke fermî ye û peyamna bihevrebûnê pê ye. Dibe aliyên pişikdar bi formarlîte be jî rêz li rewşê bigrin, lê heyeta Komara Îslamî ku digel diyalog û lojîk û rêzgirtin li pirensîpên dîplomatîk de bi tevahî xerîbe û rêûresima wan di kerbê amadebûna heyeta Partiya Demokrat, bicih hiştin.

Revîna heyeta Komara Îslamî ji ber kerb vebûna Kurdên xebatkar di vê rêûresimê de kiryareke nedrust û bêzar bû û li ber çavên tevahiya cîhanê, ne serdembûn û negoncav bûna rejîma Îslamî bo carek din selmand.

Lê, rejîma xirabkar ku ev bê şermiya di asta navçê de anîbû gore, bi wî awayî hundrî vala û mejiyê paremaya rejîma xwe nimayş kir, bona veşartina kiryarên xirab yên xwe û herwisa bo givaş xistin li ser Kurdistanê, peyamek û nûçeyeke derevîn belav kir, ku tê gotin tîmeke Partiya Demokrat xistinê davê ku çendîn kes ji wan binçavkirine û kuştin e jî!

Navenda Teşkîlata Partiya Demokrat ev nûçeya bidrev ragihand û herwisa ragihand ku rejîma tijî li çewtekariya Komara Îslamî kincên Pêşmerge ji kirêgiriyên xwe re dide da ku jixwe bikin û wan dişîne hundrî xelkê, bona talankirinê, da ku bi xeyala xav a xwe, navê pêşmerge xirab bike!

Piştî çendîn salan tawankarî û birêvebirina pîlanan di Kurdistanê de, rejîma Komara Îslamî hîn jî pena xwe bo taktîkên kevin yên xwe dibe, ku tê gotin eger kincên mîna kincên pêşmerge ji tawanbar û bikirêgirtiyên xwe bike û xelkê bi wan azar bide, êdî navê pêşmerge xirab dike.

Ev rejîmê ev yeka fêm nekiriye ku pêşmergebûn bi kincan nine, belkû pêşmerge bi kiriyar e, kiryarên mirovî yên xwe û bi xwe gorîkirina lipêxema xelk û niştimana xwe de bûye semboleke pîroz û xelk ti kiryareke xirab bi kiryarên pêşmerge nahesbînin û her di kurtirîn demê de vê yekê dizanin ku evana tawankarên girêdayî rejîmê ne, ku di nav kincên mîna kincên pêşmerge de ne!

Bo veşartina revîna xwe di rêûresima vekirina Yadgeha Barzanî de rejîma Komara Îslamî pena xwe bo pîlanekê bir, ku tê gotin tîma Partiya Demokrat di navçê de tevgeriya ye, û kevtiye dava Spaha Pasdaran, lê bi drev dersxistina vê nûçê, vê carê berdevkê ne dîplomatîk yê Komara Îslamî roja Şemiyê 23`ê Banemerê ragihand ku wan balyozê Îraqê yê li Tehranê gazîkirine û kerb û kîna rejîmê li derheq amadebûna girûpên Kurdî yên Kurdistana Îranê di vê rêûresimê de ji balyozê Îraqê re ragihandine!

Kabûsa tarîtiya Xamney ku mîna Erbûsê Yûnaniyan digel her pêngavekê de tarîtiyê tîne û tawanekê bi tawaneke din dadipoşe, di heyama wan çend rojan de jî, li hember kiryareke asayî de wisa tevlîhev bûye ku serê wê gêj bûye û nikare dest bi ti tiştekê nede, çimkû her tevgereke wî dibe sebeba wêrankirina tiştek din û xirabiyek din li ser xirabiyên wê yên din de zêde dibin.

Erbûsa serdemê ji ronahiyê ditirise û heqîqetê mîna dijminê sereke yê xwe dihesbîne, lewma nizane rêya drust ya diyalogê û çareseriyê bigire berahîka xwe. Bi bihevrebûn û hevpeywendiya mirovan û girûpan zendeqên wî diçin û dixwaze bi her away bibe hevpeywendiyan têk bide û rêyên diyalog û çaresriyan wêran bike û ten û tenê rêya xirabî û djiminatiyê dizane. Lewma, rê û pêngavên wî digel xelkê û navçe û cîhan û serdemê de nayên û tenê û tenê tarîtî û wêranî zêdetir jê dibare û dûrtir dibe.

Di dawiyê de xelk neçar dibin bo dûrtirîn navçeyên dîrokê ku ji Tartarûsê jî tarîtir û dûrtir be û bihavêjin. Çarenivîsa Xamney û rejîma wî zibildana dîrokê ye!

# Gera zeman û waneya Kurdan



N. Nûredîn Sofîzade

Roja 14ê Gulanê Hilbijartina giştî ji bona nûnerên Parlemanê û Serkomar li Turkiyê birêve çû ku di encama hejmartina dengan de heçî hizb û hevbendiyekê gorî pêgeha xwe, Kursiyên Parlemanê bo xwe misoger kirin, lê hilbijartina Serkomar bi hegera vê ku çi yek ji berbijêran nekarîn ji %50 dengan bidest ve bînin, kevte bo gera duyem ku di navbera 2 rikeberan de anku Recep Teyîb Erdoxan ji AKP ê û Kemal Kilîçdaroglu ji CHP ye.

Werin em Komarekê ava bikin, emê wekî bira bi hevdu re îdare bikin, emê hemî birayên olî yên hevdune, welatê nû ku em çêbikin welatê me hemiyane.

Ev gotin yên Lîder û avakerên Komara Turkiyê bûne bo Kurdan li dema çêkirina welatek bi navê Turkiyê piştî hilweşîna împiratoriya Osmanî de.

Ku Komar ava kirin û dewlat û welat çêkirin, vêca wiha gotin: Yek dewlet, yek milet, yek Ala û yek Ziman.

Vê rojê ve heya niha heçî serkomar û partek di desthilatê de be, parêzerê wan hêlên damezrênerên Turkiyê bûne û heçî dengekî wekhevîxwaziya Kurdan bi awayê herî hovane tepeser kirine.

Zimanê Kurdî, Çand, nasname, perwerde, hemî qedexe bûne, hemî hêza hikûmetê û welat hertim hatiye terxankirin ji bona tepeserî û ji navbirina dengê şoreşên Kurdan, Kuştarên herî hovane birê ve birine, jînosaydên mezin li Agirî, Dêrsim, Bîngol, Geliyê Zîlan de bi rê ve birine û sedan hezar Kurd ne tenê şoreşger, belku sivîl û jin û zarok jî komkuj kirine.

Hinek Hizbên desthilatdar ku her piştî çêbûna Turkiya nûvîn welat bi rê ve dibin, MHP û CHP û yên din yên ku piştre çêbûne, hemî bi yêk çavî bera xwe didin Kurdan.


Niha Hizb zêde bûne û rikeberiya wan bona gihîştina desthilatê tundtir bûye û bona serkevtina xwe û şikesta rikeberê xwe, hewcehî bi piştgirî û dengê zêdetir hene.

Gelê Kurd ku li Turkiya 85 Milyonî de, pitir ji 25 Milyon kesiye anku nêzîkî %30 nifûsa wî welatî pêk tîne, heya niha jî digel be xwediyê çi yek ji mafên xwe nine û



wekî welatiyên bê nasname û Turkên çiyayî tên hesibandin .

Di hilbijartinan de bi armanca rakêşana dengên Kurdan û mifah wergirtina ji Kurdan bo heçî Partekî Turk cehdê dike li hember partiya rikebera xwe de hindek gotin û diruşmên goya berevanî ji mafê Kurdan bilind bike û bibêje, Ev drûşmên han jî di demekê de tên dan ku sîstema welat û yasaya wan li dema hilbijartinê de îzna heçî cure piropagendeyekê dide wan û çi yêk ji





dirûşmên wan yasayî ninin.

Piştî dawîpêhatina hilbijartinan jî hekî gotî dar dikeve û toz divemire, tu yek ji wan dirûşman û rondik rijandina wan bo Kurdan, nayê bîra wan.

Renge ewa mafê wan be û ji bona serkevtina xwe hevarê dibin bo heçî karekê, lê pirsyar eve erê gelo Kurd çima tenê bo carekê waneyê ji ev hemî ceribandinên derbasbûyî vernagirin?

Kîjan Partên Turk ku xwe parêzerên hêlên destpêka avabûna Komara Turkiyê dizanin, hatine ser kar û cihgurkê kirine, heya niha bo Kurdan û berçavgirtina mafê wan tenê pêngavek havêtine ku mafê Kurdan di wî welatî de bixne nava yasaya bingehîn a welat? Mixabin bi bandora piropagenda sedem li hilbijartinê de jî gelê Kurd bi ser wan partiyan de parve bûne û dengên wan qazenc bo her aliyekê heye tenê Kurd nebin.

Ger dengê Kurdan hemî li serhev ban, ger Partiyekî Kurd bikarîba hemî Kurdan devra xwe kom bike, bêguma bi nifûsa %30 xwe li Turkiyê de dê bibana yekem dengê bihêz yê di nav heçî rikeberiyekê de.

AKP ê bo 22 salan Kurd bikar anîn, niha CHP bi navê xemxwarê Kurdan, dixwaze Kurdan bikar bîne, ma ne bese ku Kurd dersê ji kiryarên xwe wergirin, ma ne bese Kurd îznê nedin ku Partiyên Turk wan wekî leîstokan bikar bînin?

Bo hilbijartina 14ê Gulanê jî CHP û Kilîçdaroglu yê serokê wê, ji bona rikeberiya di gel Erdoxan û partiya wî, berevanî kirina ji Kurdan kiriye çeka herî bihêza xwe ya piropagende, karî bi wî awayî dengê piraniya Kurdan û partiyên wan bo xwe rakêşe.

Dîsan li virda çend pirsyarek tên pêş, erê gelo ger Kilîçdaroglu bê ser kar û bibe serkomar, ma dê bikare ji vekirina 2010an Erdoxan "AÇILIM" deriyan bo Kurdan veket? Gelo ger CHP bo Kurdan başe û gorî piropagenda CHP ê û hinek Kurdan, piştî evê ku bibe serkomar, dê rêzdar Ebdulla Ocelan û Selahedîn Demirtaş li hepsê serbest bike, ma heman serdemê deshilatdariya CHP ê û serokê vê Bolend Elcewîd de nebû ku komeleya navnetewî çêkir û Ocelan girt?

Heya niha Erdoxan yan heçî kesekî din ku deshilatê de bûne , li derheq nêrîna bi doza Kurd ma çi cudahiyek gel CHPê hene?

Ger ev di dema piropagenda de basê Kurdan dikin, ma kengê soz dane dê mafê Kurdan li destûra welat de cih bikin, dê perwerdeya Kurdî bikin bi fermî, dê mafê wekhev yê Turkan bo Kurdan berçav bigrin?

Lewma, Kurd divê dersê ji derbasbûyî verbigirin û êdî wir şûnda nebin lîstokên hilbijartinan û piropagenda rikeberiya deshilatdaran.

# Rapora RSF û awirdanek li rewşa rojnamevaniyê di Îranê de



N: Bêhzad Qadirî
W: Hesen Mukerem

Di heyama rojên derbasbûyî de, Saziya Nûçegihanên Bêsînûr (RSF), 21emîn rapora rêzbendiya xwe belav kir. Vê saziyê di raporekê de bas ji vê yekê kiriye ku di heyama sala borî de piştî qetla hikûmetî ya Jîna Emînî, Îranê cihê xwe mîna yek ji serkutkertirîn welatên cîhanê li barê azadiya medayî de bihêz kiriye.

Di vê gotarê de çavxişandinek bi Saziya Nûçegihanên Bêsînûr û rewşa rojnamevaniyê di cîhanê de bigiştî û bitaybet li Îranê dikin.

Saziya Nûçegihannên Bêsînûr Saziya Nûçegihanên Bêsînûr saziyeke nehikûmî-navnetewî ye ku mebesta vê barevanîkirin li mafê azadiya belavokan û piştevanîkirin ji nûçegihanan û rojnamevanan hatiye avakirin. Binkeya navenda vê saziyê li Firansayê ye. Û erka vê propangende bo rojnamevaniya azad, serbixwe û pir rehend û berevanîkirin li personelên medyayan e. “RSF” Saziya NY, UNESCO Şêwreya Ewropayê xwediyê pêgeha şivêrmendiyê ye.

Ev saziya di warê berevanîkirin li rojnamevanên ku metirsî li ser wan e û herwisa di bilindtirîn asta encûmenên dewletî de û navnetewî de bo berevanîkirin li mafê azadiya gotinê û zanyariyan, çalakiyan birê ve dibe. Herwisa bi awayê rojane raporên pêwendîdar bi gefên ser azadiya medyayan bi zimanên, Firansî, Îngilîsî, Spaniyayî û Pirtqalî, Erebî, Farsî û Çînî pêkêş dike. Herwisa salane lêkolîna rewşa azadiya belavokan li ser navê “Pêverên azadiya cîhanî ya belavokan, belav dike” ku wirda rewşa medyayan li 180 welatên cîhanê de tên hilsengandin û gengeşekirin.

21emîn rapora rêzbendiya RSF Saziya Nûçegihanên Bêsînûr di 21emîn rapora rêzbendiya xwe de ku di vê heyamê de belav kiriye, bas ji vê yekê kiriye ku di heyama sala borî de piştî qetla hikûmetî ya Jîna Emînî de, Îranê cihê xwe mîna yek ji serkutkertirîn welatên cîhanê di warê azadiya medyayî de bihêz kiriye. Herwisa di vê raporê de Îran bi yek ji mezintirîn girtîgên cîhanê bo rojnamevanan hatiye binavkirin

Di vê raporê de hatiye: Herçend ku serkuta destpêragihîştin bi zanyariyan bi şêweya pir bihêz û berfireh di Îranê de li gore de ye, û rojnamervanan berdewam digel metirsya binçavkirin, lêkolînkirin, hepsîkirin, di bin çavdêriyê de bûn û digel azar û gefan rû bi rû ne, lê ev rewşa han hevdem digel şoreşa Jînayê tundtir û xirabtir bûye.

Nûçegihanên bêsînûr di vê raporê de bas ji vê yekê kirine ku: Rewşek hat pêş ku zêdetir li 70 rojnamevan ku li hejmareke zêde ya wan jin in, di rewta xwenîşandanan de, li Îranê hatine binçavkirin, çimkû desthilatdarên Komara Îslamî bo rêgirîkirin li romala xwenîşandanan, dest bo her kiryarekê dibin.

Nûçegihanên bêsînûr, di berdewamiyê de, îşare bi serkut û gef li rojnamevanên Îranî li derveyî welat jî kiriye û nivîsiye: Heta rojnamevanên Îranê ku li rûniştiyên welatên derve ne, di bin gef û gvaşên Komara Îslamiya Îranê de ne. Her pêka rapora Nûçegihanên bêsînûr, li destpêka avakirina Komara Îslamî li Îranê di heyama 40 salên borî de, aliyê kêm rejîmê 1000 rojnamevan û welatî-nûçegihan binçavkirine, zindanî û bêserûşûn kirine an bidarvekirine.

Azadiya medya û gotinê di cîhanê de
Azadbûna mirov li gotinê de, raman, hizr, bawerî yekek ji mafên destpêkî û îtrafkiriyên mirovî yên vî serdemî ne ku heta li sala 1945`an Zaynî piştî derçûna Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirov di xala duyem de bi eşkere îşare pê hatiye kirin. Mirov di gotina hizr û ramnên xwe de azad e, û hikûmetên endam di Saziya NY de pêbendkirine ku beravanî ji vî mafî bkin, ji bo vê ku her takek bi bê tirs, lêpirsîn û lêpîçîn û siza û nerîna xwe bêje.

Welatên ku di cîhanê de bi welatên demokratîk tên naskirin, gotin pareke ji nasnameya demokratîk bûnê ye û bi yasa û bi kultûrî jî di civakê de pêrewî tê kirin ku kes li ser gotina hizra xwe û balkşandina xwe nayê siza dan.



Ji bo mînak; Alman welatek azad û demokratîk e, azadiya ragihandinê, belavok, raman û azad cuda ye, di yasa bingehîn a wî welatî de misoger û reng daye. Girîngiya hizr û nerîna azad û azadiya gotinê li biryara “Lovêt” li sala 1958`an a Zaynî de, pêdagîrî li ser hatiye kirin, di vê biryarê de hatiye: Mafê bingehîn yê azadiya bawer û dîtingeh, wek serrastîrîn derkevtina kesayteiya mirovî di civakê de ye, pareka herî bingehîn a parên mafê mirov e û bo nezima dewleteke demokratîk karlêker û girîng e.

Rewşa medya û gotinê di Îranê dedDîroka Çil û çend salî ya desthilatdariya Komara Îslamî tijiye ji wan mînakan ku her mirovek eger hizr û raman û nerîna xwe bîne ziman, ev yeka berevajiyê hizr û ramana desthilatê be, piştire kevtiye girtîgehê, û hatiye îşkencekirin û bidarvekkirin û dûrxistin an navê wî\ê hatiye birîn.

Herwisa di rewta serhildana “Jîna”yê de di Îran û Kurdistanê de, tevî serkutkirina gelên serhilday yên Îranê, Komara Îslamî bi tundtirîn şêwey rojnamevanên navxwe xistin bin givaşan, û gelek welatî hatin binçavkirin û cezayên giran bi ser wan de sepandin û hinek rojnamevan neçarbûn welat biterikînin û beraxwe bidin dervey welat.

Di rewta vê serhildanê de, zêdetir ji 70 rojnamevan ku rêjeyeke zêde ya wan jin bûn, hatin binçavkirin. Ev yeka tê vê wateyê ku, rewşa rojnamevanan li Îranê ber bi xirabiyê ve herikiye û di Îranê de tiştek bi navê azadiya gotinê hebûna vê tuneye.
Komara Îslamî bi piştgirêdan bi refanduma nedemokratîk ya sala 1358an a Rojî dibêje: Civaka Îranê deng daye bi Îranê ku dibe nizama desthilatdar li Îranê de pêha şerî`eta Îslamî be. Bi vê hincetê jî nedemokratîktirîn û dijî mirovtirîn yasay bi ser xelkê de disepîne û azadiya gotinê

Dom R:5

Doma R:4

jî di vë çarçêveyê de pênase dike.

Gefên Komara Îslamî li ser rojnamevan, medyayên Îranê (an ser bi neteweyên din yên di çavçêveya siyaseta Îranê de) li dervey welat.

Herwisa li destpêka mijarê de hatibû, Saziya Nûçegihanên Bêsînûr bas ji vê kiribû ku, “heta rojnamevanên Îranî jî li dervey welat rûniştîne, di bin gef û givaşên Komara Îslamiya Îranê de ne”. Rejîma Îslamiya Îranê her li destpêka gihîştin bi desthilatê heta niha, hertim li serkut û jinavbirina fîzîkî(teror) bi dijî neyarên xwe mifah wergirtiye û di vê barê de tenê çalakvanên siyasî yên dijberê rejîma Îranê nebûne qurbanî, belkû rojnamevanên dijberên Komara Îslamî jî parek in ji qurbaniyên dezgeha serkut û terora Komara Îslamî.

Di welatên demorkatîk de, li barê ewlehiya rojnamevaniyê de ji aliyê hêza polîs ve tên parastin û di egera her gefekê de, polîs çavdêriya taybet birê ve dibe û wan diparêz e. Helbet, ev yeka jî bi vê wateyê nine ku rejîmeke dîktator mîna rejîma niha ya Îranê nikare gefa can biafirîne! Bo mînak li sala 2022`an a Zaynî de polîsê Birîtaniya raporek belavkiriye ku ji aliyê rejîma Îranê ve li 15 rojnamevanên rûniştiyên Birîtaniyayê gef hebûye ku polîsê nehênî ev pûç kiriye.

## Dawî

Her di destpêka avakirina Komara Îslamî de, karê medya û ragihandin di Îranê de mîna karê ewlehî jê hatiye. Helbet li serdema rejîma berê de jî her bi wî awayî bû.
Deng û Rengê Komara Îslamî jî bixwe yekek ji wan saziyan e ku bi şêweya rasterast li nivîsîngeha Elî Xamineyî rêberê rejîmê biryarê wedigire. Lewma, li dervey çarçêveya Komara Îslamî de, gotin û hizr û raman, ji aliyê Komara Îslamî ve tenê bersivek jêra tê dan: “Bêdeng be, neku emê bixwe te bê deng bikin”

# Şorişek civakî û jêketên siyasî



N: Ebdula Hicab

Ev têgeh, serbas a axaftinekê bû ku roja şemî 13.05.2023 li semînar a “jin, jiyan, azadî” li Stockholm a paytextê Swêdê hate pêşkêş kirin.

Mesaj zelal û xwebêj e, têgeh a “jin, jiyan, azadî”, di gel wateya xwe ya siyasî bûye nêrînek alternatîv li ser jiyan, civak û mafê tak di civakê de.

Ev şorişek e, şorişek civakî ku Rojhilata Navîn, Îran û Kurdistanê pêwîstî pê heye û bi salan e ku li bendê ye. Şoreşeke li ser zêhniyeta serdest ku dikare bibe bingeh ji bo guhertinên siyasî di pêşerojê de.

Çavkanî û jêder a wê şorişê, tevgera kurd û xebata bi dehan salan ya jin û mêrên Kurdistanî ye ku bi salan e li her çar perçeyên welat li dijî bê edaletî, bê mafî û cudakariyên siyasî û civakî li berxwe didin. Ev têkoşîn û îradeya berxwedanê bûye heger ku Kurdistan her tim pêşeng û amadey serhildanan be. Şoreşa «jin jiyan, azadî» jî berdewamiya wê riha berxwedanê ye.

Bi taybet pêşengiya jinan, birgehek nû ya wê şorişê ye ku wê qonaxa serhildanan ji demên pêşîn cuda dike û niha diçe ku bi xwe re encamên kûr û bi bandore siyasî û civakî di pêşeroja Îranê de bîne.

Cudaiyek din ku di wê qonaxa têkoşînê de derketiye holê, ewe ku wê carê serhildan û zêhniyeta şorişgerî ji sînûrên Kurdistanê derbas bû û di demek kin de li hemû Îranê belav bû. Hawara jinên kurd ku di rêûresma spartina axê ya cangorî Jîna Emînî de ji goristana «Ayçî» ya bajarê Seqizê bilind bibû, di demek kurt de li her derê Îranê deng veda û bû sembola şoreşa nû ya gelên Îranê li hember dîktatoriya Komara Îslamî.

Eger yek ji hegerên sereke yên pelvedan a bi lez a wê şorişê nerazîbûna neteweyên Îranê li dijî deselata siyasiye komara îslamî be, hegerek din vedigere ser helwêsta civaka serhildêr li hember zêhniyeta kevneparêze serdest.

Ew tê wê wateyê ku helwêsta xelkê hem li hember rewşa siyasî ye, û hem li dijî wan qalib û çarçoveyên civakî ku rê didin beşek ji civakê îradeya xwe bi ser beşek din a civakê de ferz bike.

Ev xwe ferz kirin, dikare serdestiya mêr bi ser jinê de be, serdestiya bawiriyek olî, siyasî an îdeolojîk bi ser nêrîn û bawiriyên din de be, dikare serdestiya neteweyek bi ser neteweyên din de û an jî serdestiya qadek civakê bi ser dadek din de be. Bi zelalî armanca wê serhildanê guherîna hemû wan nêrîn, hizir û îradeyan e ku xwe bi ser hemû ewên din de ferz dikin, cudaiyan biparêzin û reng û şeklê pîroz didin wê parastinê.

Ne tiştek veşartî ye ku armanca wê şorişê jî, weke hemû serhildanên li hember sîstemên kevneparêz û dîktator, di serî de serûbin kirin a sîstemê û guhertina deselatê ye.

Lê şoriş a «jin, jiyan, azadî» di heman demê de nêzîkbûnek cuda ye ji bo pirsên civakî, dadwerî, wekhewî û eqlanî jî. Ew şorişeke li dij nêrînên şovinîstî, mêrsalar û ne yeksan yên ku di civakê de serdest in. Ev şorişeke ji bo guhertina zêhniyetê.

Ezmûna serhildana sala 1357 (1979) li Îran û Rojhilatê Kurdis-



tanê û serhildanên siyasî li Rojhilata Navîn di wan du dehikên dawî de (serhildanên li welatên erebî ji sala 2010 û pê ve), pitir pêwîstiya guherîna zêhniyetê derdixe rojevê.

Her du ezmûn bi zelalî nîşan didin ku tenê avêtina rêjîmên pêşîn û cîgirkirin a rêjîmên nû, bi xwe re guhertin û çêbûnê nayîne. Sala 1357 li Îranê rêjîm hat guhertin, siyaset ji nû ve hate dizeyn kirin, birêveber hemû hatin guherîn, lê zêhniyeta cudakar ne tenê berdewam bû, belkû şidiya û pitir cudakarî xiste nava civak, pêkhateyan û neteweyan.

Li Tûnis, Yemen, Misir û Lîbiya rêjîm hatin guherîn, lê li hemû wan welatan deselatdarên nû li gor heman zêhniyeta deselatdarên pêşîn siyaset kirin û rewş li ciyê ku baştir bibe, bi deh qatan xirab bû.

Li Sûriyê nîva welat kavil bû bêy ku rewşa siyasî an civakî ber bi başiyê ve here, bigre rewşa heyî sed qat xirabtir kir.

Dom R:6

Doma R:5

Li ser wê bingehê şorişa «jin, jiyan, azadî», rêya rast girtiye ber xwe û bi guherîna rêjîmê re, guherîna zêhniyeta dîktatorxulqên ji xwe re kiriye armanc. Şoriş, parastina mafê jinan, jiyanek baştir û têgihîştinek nû ji bo jiyan û azadiyê weke armanc da ye ber xwe.

Ew armanc, îdealên nû dixuliqîne û dixwaze bi guherîna rêjîmê re, zêhniyeta ku rêjîma komara îslamî anî ser kar jî biguhere.

Li gor îdeolojî û felsefeya Komara Îslamî, jin mirovek pile du û «emrazek» e ji bo jînxweşiya mêran.

Destûr a bingeîne rêjîmê ku xwe dispêre nêrînên teng yên çaxê tarîtî û nezaniyê, rê nade ku jin weke «tak» xwedî pêgeha serbixwe ya civakî be. Pirsên wekhevî, mafê jinan, pîvanên mafên mirovan û serxwebûna abûrî û civakî ya jinan, li gor destûr û nêzîkbûna karbidestên Komara Îslamî tawan têne hesibandin. Ew nêzîkbûn, êş û azara jinbûnê zêdetir dike û rêya pêşketina jinan di civakê de digre.

Lê hin pîvan an norm û kevneşopiyên civakî jî li ser rêya azadiya jinê asteng in. Nêrînên mêrsalar, girêdayî kevneşopiya deselatê, serdestiya têgehên paşvero ku xwe dispêrin têgihîştinên tenge kultûrî û şiroveyên ne eqlaniî li ser ol û baweriyan, hemû li ser rêya mafê wekheve jin û mêran asteng in.

Deselat wan nêrînan heta ji bo bindest kirina neteweyan û parastina cudakariyan bikar tîne.
Deselatdarên dîktator mafê jiyanê jî tenê di çarçoveya xwarin, vexwarin û xizmetkirinê de bi sînûr dikin. Lê mafê jiyanê prensîpa bingehîn a mafê mirovan e.

Li gor wê prensîpê «her mirovekê mafê jiyan, azadî û ewlekariya takekesî» heye. Ev maf girêdayî bawerî, pêgeha civakî, zayend, paşxan a etnîkî, abûrî, kultûrî, neteweyî û hwd nîne. Ji bo têgeha azadî jî, her heman nêrîn derbas dibe. Azadî li gor felsefe û ramana komara îslamî û nêrîna serdest, azadiyek sînûrdar e ku mirovan dixe çarçoveya hin pîvanên «negor» ku bi guherîna rêjîman naguherin.

Li hember wê zêhniyetê, şorişa «jin, jiyan, azadî» bersivek cuda û nêrînek alternatîv tîne rojevê.

Li gor wê nêrînê, divê pîvanên civakî jî bêne serrast kirin, hin pîvan ji nû ve bêne dariştin û hinek jî ji binî ve bêne guhertin.

Ew zêhniyeta alternatîv e ku dibe binghe ji bo nêrînên cuda ku civakê ji bo şorişek siyasî ya xwedî bandor amade dike. Lewma şorişa «jin, jiyan, azadî», bi sîstema siyasî re, dixwaze zêhniyetê jî biguhere.

Li ser wê bingehê, ew şoriş pêvajoyeke ku dikare bi gelek qonaxan re derbas bibe.
Dikare rastî hilkişîn û dakişîn bibe, lê wê her bigere û tovê berxwedanê bireşîne. Renge tevger di demek nêzîk de nekare rêjîma dîktator a komara îslamî hilweşîne, lê di dawiya dawî de wê bi ser dîktatoriyê de bi ser bikeve. Weke çawan em dibînin her ji niha ve hin sitûnên parastina rêjîmê hejandine.

Yek ji xalên herî xurte şorişa «jin, jiyan, azadî» ewe ku tevger şorişeke li hember tundûtîjiyê, û bi xwe jî dûreperêz e ji tundûtîjiyê. Tenê çeka şorişgerên ku niha li qadan in, ew dengê nerm û nazike ku ji qirka zarokan, keçên li dibistanan û xwendingehên navendî û jinên têkoşere civakê bi piştgiriya xort û mêrên genc bilind dibe. Lê her ew dengê nerm û aram, niha bûye zengila dêrê û guhê ehrîmenên Tehran û Qumê kir dike. Zexta ku niha Komara Îslamî xwe di nav de dibîne, karîgertir e ji wê zextê ku şerên ku bi salane rêjîm, vir de wê de bi rêve dibe û dorpêçên abûrî û siyasî lê kirine.

Dijkiriyara rêjîmê li hember pêla şorişê, weke her car çalakkirin û bikar anîn a mekanîzmên serkut û zext û zorê ye. Rêjîmê dixwaze bi kuştin, darvekirin, girtin, tirsandin, destdirêjîkirin û terorê xwe biparêze, lê weke xuya roj bi rojê ji hejmara parêzvanên rêjîmê kêm dibe. Îro meşrûiyeta komara îslamî di asta herî kêm de ye, bi awayekê ku her roj beşek ji bazneyên dora rêjîm diqutisin û benê dora stuyê rêjîmê hê zêdetir dişide.

Lê ew rastî nayê wateya ku rêjîm wê di demek nêzîk de hilweşe.
Hêzên çekdare komara Îslamî ji deselata leşkerî bi der, kontrola abûrî, ticaret, hawirde û hinarde û pîşesaziya welat jî girtine destê xwe.

Ev tevlêbûna hêza serkutker û deselata abûrî hegerê sereke ye ku rêjîma komara îslamî li ser lingan maye.

Divê ku pêvajoya hilweşîna rêjîmê dûr û dirêj be, lê bandora civakiye şorişa «jin, jiyan, azadî» ji niha ve derdikeve û roj bi roj pitir civakê ji bo şorişek siyasî amade dike. Bandorên civakiyê wê şorişê gav bi gav di jiyana civakê de derdikevin û ji bo pêşveçûn û destketên xwe, li benda hilweşîna rêjîmê namînin.

Ev pêvajo her roj bi xwe re nûbûn, guherîn, pêşketin û gulvedanê tîne.

Li ser wê bingehê, şorişa «jin, jiyan, azadî», hem li hember rêjîmê û hem jî li hember tevaxwazên ku xwe ji bo ku ciyê wê rêjîmê bigrin, alingariyek şorişgerî ye.

Ew şoriş azadiya mirovatiyê di azadî û wekheviya jin û mêran de dibîne, mafê jiyanê tenê bi xwarin û vexwarinê ve girê nade û têgeha azadiyê di çarçoveyek nû de şirove dike.

Wate ew şoriş dixwaze qeware û çarçoveyên cîgirtî biguhere û nêrînek nû bîne rojevê, nêrînek ku «mirovnavend» e û beriya qad, nêrîn, pêkhate, ol û kultûr, mirovan weke «mirov» dibîne, dinirxîne û xizmetê jê re dike.

**Jin, jiyan, azadî ...**

# Dadgeha Pîranşarê ceza da 7 xwepêşanderan

7 welatiyên ji Pîranşar a Rojhilatê Kurdistanê ku bi tawana beşdariya xwepêşandanên sala borî hatibûn desteserkirin, bi cezayê girtîgehê, pere û lêdana qamçiyan hatin cezakirin.

Li gor zanyariyan, Dadgeha Tawanan a Pîranşarê cezaya 15 sal girtîgehê, 160 qamçiyan û cezayê pereyan li wan 7 welatiyan birî.

7 welatî bi tohmeta “têkdana ewlehiya giştî, çûnûhatina neyasayî di sînoran re, çêkirina molotof kokteylan, çêkirina çek û cebilxane” hatin girtin.

Taha Resûliyan, Sîna Deşmîr, Ehmed Ebdullapûr, Mohsîn Qadirî, Çiya Şehîdeqdam, Ebdullah Qenberîwend û Mehmûd Qenberîwend di du mehên destpêkê yên zivistana par de hatibûn desteserkirin û piştre bi pereyan hatibûn berdan.

Li gorî rêxistinên mafên mirovan, Ebdullah Qenberiwend û Mehmûd Qenberiwend xwedan pêdivî taybet in û Taha Resûliyan jî çalakvanê sivîl û hunermend e.

## Nerîna Lîderan



**“Şêx Mihemed Bin Ebdulrehman Al Sanî ”:**

Her welatek biryara wê ya serwerî heye ji bo asayîkirina pêwendiyên bi Sûriyê re



**“Volodymyr Zelenskyyt”:**

Hin serkirdeyên Ereb çavên xwe ji dagirkirina neqanûnî ya Rûsyayê ya Ukraynayê re girtin



**“Beşar Esed :”**

Pan-erebîzm di paşeroj, niha û paşeroja Sûriyê de ye



**“Aleksandr Lukashenko”:**

Ewropa ji bo şer amadekariyê dike

# Simayîl Şerîfzade, xala bi hêz a hemû şêwazên xebatê



**N: Selam Îsmaîlpûr**

Her sal roja 12ê Banemerê têkoşîn û qurbanîdana şehîd Simayîl Şerîfzade û komek ji têkoşerên riya rizgariya Kurdistanê tê bîranîn, ku bêyî berçavgirtina dijwariyan û tenê bi vîna xwe ya şoreşgêrî dîrokeke nû ya coş û wêrekiyê afirandin. Wan ev vîn da nifşên piştî xwe da ku ji bo xwe bibin afirînerê rewşeke dilxwaz. Herwisa da ku ti şert û mercan ji xwe re nekin hincet ku li ser hevkêşeyên civakê pasîf û bê bandor bimînin û vîna guhertin û ji nû ve teşekirina jiyanê bi şert û merc, astengî û derfetan ve girê nede.

Şerefzade dengê bilind ê zanîngeh û kolanan bû, cihê hevdîtina tevgera rewşenbîr û xwendekaran, tevgera çep a dijî kolonyalîst, tevgera siyasî ya netewî ya Kurd û çekên Pêşmerge di dilê çiyayan de bû ku wê demê heybeta dîktator û dagirkariya faşîzma Pehlewî li hemû Îranê û li Kurdistana Rojhilat herî zêde bû.

Şerefzade wek yek ji sembolên tevgera partîzanî ya sala 1967an, roleke girîng di pêşvebirina radîkalîzma şoreşgêrî û pêşverû ya tevgerê de lîst, ku piştre di bîra dîrokî ya tevgera netewî ya Kurd de mabû. Ew wek rênîşanderek di sir û seqemê de bû ku rê li ber fikir û pênûsên şoreşgêrî û nûjen ên ku li pey wî bûn, vekir.

Ev serhildan xaleke dîrokî bû ji bo Kurdistanê, ji ber ku piştî karesata rûxana Komara Kurdistanê, pêla girtin û eşkerekirina tîmên rêxistina Hizba Demokrat, ku piştî birînên giran ên komarê, hewla avakirina xwe didan lê dihatin girtin û tevgera Kurdistana Rojhilat bi vî awayî ziyanbar dibû. Li başûrê Kurdistanê tevgera Kurd gelekî girêdayî siyasetên berjewendîperest ên desthilatdarên Îranê bû û hewl dida ku hemû potansiyela şoreşgêrî ya têkoşerên Rojhilat di pêxema vê hevpeymaniyê de bihelîne.

Ev yekem ezmûn bû di dîroka tevgera niştimanî ya îroyîn a Kurd de li Rojhilat ku Pêşmerge wek hêzeke partîzanî li hember dagirkaran rawestiya, ji ber ku şerên berê yên hêzên Pêşmergeyên komarê, li eniyên şer bû ji bo parastina serweriya netewî, siyasî û nasnameya netewa Kurd. Ji ber vê yekê, pêşengên tevgera 1947-1946’an ji bo têkoşîna nifşên paşerojê wek destpêker û rêber dikarin bêne pênasekirin.

Li ser asta Îranê, rêjîma Mihemedriza piştî derbeya 19’ê Tîrmeha sala 1953’an, tepeserkirina hemû aliyên siyasî û kontrolkirina serhildanan, piştî bilindbûna nirxê petrolê, di asta herî bilind de bû. Partiya Tûde, ku mezintirîn partiya çep a Rojhilata Navîn bû, bi tevahî hatibû rûxandin, rêxistinên wê hatibûn hilweşandin û kadrên wê hatibûn girtin, rêxistina efserên wê yên bihêz hatibûn rûxandin û serokên wê reviyabûn derveyî welat. Xwepêşandanên destpêka salên 1940’î ya civaka olî ve, ji aliyê bazirgan, bazarî û feodalên ku ji rêformên bi navê Şoreşa Spî nerazî bûn ve hatin tepisandin. Tewra neteweperestên lîberal ên mîna Alî Amînî, serokwezîrê bijarte yê Amêrîkî, ji kar hatibû avêtin.

Di van şert û mercan de, rejîma Şah di wê baweriyê de bû ku rêforma axê û şoreşa spî kariye aliyên çep bê hêz û bê bandor bike. Rêjîmê wisa difikirî ku wan aliyên çep û çarçoweya şoreşa karkeran ji nav birine. Ji tevgera mafên sivîl ên reşpêstên Afrîqî, tevgerên mafxwazî li seransere cîhanê, tevgera jinan û tevgera dijî Şerê Vietnamê li Dewletên Yekbûyî bigire heya tevgerên rewşenbîr û xwendekar ên çepgir û radîkal li Ewropayê, ji serhildana Çekoslovakya li dijî komunîzma Sovyetê di Bihara Pragê de heya tevgerên partîzanî yên li Amêrîkaya Latîn heya şoreşên çînî û rojhilata Asya, têkoşîna Filistînê li Rojhilata Navîn, şerê di navbera neteweperestên Ereb ên bi pêşengiya Cemal Abdul Nasir de li dijî Îsraîlê, şoreşên Zafer ên li Oman û Başûrê Kurdistanê, hemû cîhanê agirê serhildan û şoreşên li dijî kolonyalîzma biyanî li xwe girtibû.


Di van şert û mercan de, Yekîtiya Sovyetê wekî quntara bloka çep, piştî mirina Stalîn û hatina Xrusçev ser desthilatdariyê Çîn, yanî destpêka şoreşa gundan û dorpêçkirina bajaran, siyaseta xwe-guihertinê pejirandibû. Serokatî û manîfestoyên şoreşgêrî yên Moskoyê yên partiyên çep ên Sovyetê yên wekî Partiya Tudeh a Îranî kêmbandor bibûn û rewatiya wan ya şoreşgêrî ji holê rabûbû.

Di hember de li seranserê cîhanê bi serkirdatiya Çînê ,xebata partîzanî giraniya xwe dabû ser xebata gundî û karkerên gundan û rola çîna karker wekî pêşengê şoreşê ji bo guhertina bingehîn û radîkal bû.

Di van şert û mercan de tevgera xwendekaran li Îranê ku di rewşa nîvvekirî ya destpêka salên 1940’an de firsend hebû ku tevbigere û xwe nîşan bide, ji bandora vê rewşa şoreşgêrî ya radîkal bêpar nebû. Xwendekarên ku di vê çarçoweya şoreşgêrî de guhertin û rewşa şoreşa cîhanê û xemsarî û pasîfbûna Krûşçov û komunîzma rûsî ji nêz ve şopandin, bi hin mînakên têkoşînê yên balkêştir ku bandora kesayetên wek Mao, Hu Chi Minh, Castro û Che Guevara li ser wan hebû. Wê demê, rewşa navxweyî ya partiyan, ne bersivdayîna gotara partiyên sereke yên wekî Tûde û Eniya Netewî û girtina rêyên xebata siyasî ya yasayî, ew bêhêvî kirin û ew ber bi guhertineke fikrî û hizrî ve birin.

Li ser bingeha vê guhertina hizrî bû ku ji zanîngehan û şaxên xwendekaran ên par

# Sûriya û qonaxeke nû



N: Ebdûlazîz Qasim

Îro piştî nêzîkî yazdeh salan ji dabirîna têkiliyên Erebî digel rêjîma Sûriyê, careke din vedigere Komkara Erebî, ku Serokê Sûriyê Bişar Esed bo yekemîn car piştî destpêkirina kirîza Sûriyê ji sala 2011an ve, li roja pêncşemê 18'ê Gulana 2013'an gihişt bajarê Cidde li Erebistana Si'ûdiyê bo beşdariyê bike di xula 32an ya lûtkeya komkara Erebî de, ku dumahîk car di sala 2010an de beşdarî lûtkeya Erebî bibû ya ku li bajarê Sirtê yê Lîbyayê hatibû lidarxistin, ku hêj rêberê Lîbyayê Muamer Qezafî serokatîya lûtkeyê dikir.

Ku îro 19'ê Gulanê, Lûtkeya komkara Erebî li Erebistana Si'ûdiyê lidar dikeve digel çend krîz û doseyên herêmî û navxweyî yên aloz û gerim, di serî de asayîkirina têkiliyên Erebî ligel rêjîma Sûriyê piştî pitir ji yazdeh salan ji dabirîn û sizayên navdewletî, bi taybetî sizayên Amerîkî.

Hevdem ligel asayîkirina têkiliyên Ereban digel Şamê, têkiliyên Sûriyê-Tirkiyê di bin çavdêriya Rûsya û Îranê de bi awayekî berçav pêş dikevin, ku tê çaverêkirin têgihîştinek di navbera rêjîma Sûriyê û komên çekdar yên girêdayî opozîsyona Sûriyê ya alîgirê Tirkiyê de jî peyda bibe, heta digel Rêxistina "Heyet Tehrîr El-Şam" ya terorîst jî, ya berê bi navê "Cebhet El Nusra" dihat nasîn.

Îro ligel destpêkirina proseya asayîkirina têkiliyên Erebî û herêmî digel rêjîma Esed, çi tê xwestin ji aliyê kurdî yên Rojavayê Kurdistanê?

Hevdem ku têkiliyên hin dewletên erebî û herêmî bi taybetî Rûsiya, Îran, Iraq û Lubnan bi carekî ligel rêjîma Şamê nehatibûn birîn.

Îro bi dîtina min metirsiya mezin li ser pirsa Gelê Kurd li Rojava wê pitir ji aliyê têkiliyên di navbera Sûriya- Tirkiyê de be, ku metirsî heye li ser çarenivîsa miletê kurd yê



Rojavayê Kurdistanê û pirojeyên Tirkiyê yên ji bo vegirandina pitir sê milyon erebên Sûriyê yên penaber li Tirkiyê li nav axa Rojavayê Kurdistanê, lê metirî dê mezintir be eger hemahengî û rêkeftin hebe di navbera herdû Têkiliyên Erebî-Sûrî û têkiliyên Tirkiyê-Sûriyê yên di bin çavdêriya Rûsya û Îranê de!

Heta helwêsta Amerîka û Israel derbarê van bizavên Erebî û herêmî bi awayekî zelal xuya nebûye tevî redkirina asayîkirina têkiliyên digel rêjîma Sûriyê, her wiha ku Amerîka heta niha helwêstek zelal nedaye li hember parastina Gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê û zêdebarî nakokiyên mezin yên di navbera aliyên Kurdî de, yên ku roj bi roj aloztir û mezintir dibin.

Hin Roj Xwe Nû Dikin û Hin Roj Qet Di Mêjiyê Mirov De Nayên Guhertin.

Me di dil de hêvî kiriye heval, jiyana reş çiqas xwe reş bike jî emê bi hev re li ber xwe bidin.

## Sûriye bêyî ku ti lêpirsîn li ser tawanên şerê navxwe bên kirin vedigere Komkara Erebî

Lûtkeya Komkara Erebî li bajarê Cedde yê Erebistana Siûdiyê birêve çû ku gelek şîrove li ser vegera Sûriyê heye û gelek karvedan jî hene. Mamosteyê Zanîngeha Saint Joseph a li Beyrûtê Dr. Elî Ewin got, "Tişta ecêb ew e ku Esed vedigere Komkara Erebî bêyî ti lêpirsîn derbarê tawanên şerê navxwe li gel bê kirin.

Di dema ku welatên Ereb peywendiyan li gel Sûriyê asayî dikin û Serokkomarê Sûriyê Beşar Esed li Lûtkeya Komkara Erebî li bajarê Cedde yê Siûdiyê amade dibe, wêraniya şerê navxwe yê 12 salan li vî welatî hatiye paşguhkirin.

Mamosteyê Zanîngeha Saint Joseph a li Beyrûtê Dr. Elî Ewin anî ziman, "Ne tiştekî ecêb e dema Sûriyê vedigere civîn Komkara Erebî, ji ber piraniya welatên Erebî dîtin ku dûrxistina Sûriyê yan guhertina rejîma Sûriyê di vê demê de zêde zehmet e lê tişta ecêb ew e ku vedigere Komkara Erebî bêyî ti lêpirsîn derbarê tawanên şerê navxwe li gel bê kirin, ev yek peyameke xirab e ji bo welatên cîran û navçeyê dişîne."

Derbarê pêgeha opozisyona Sûriyê de li gel van pêşhateyên mezin li navçeyê û her wiha destpêşxeriya Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina krîza Sûriyê Mamosteyê Zanîngeha Saint Joseph a li Beyrûtê Dr. Elî Ewin got, "Bi rastî di bingehê de opozisyon li Sûriyê nîne, em behsa 12 salên şer dikin ku opozisyonê pêgeha xwe ji dest daye, niha tenê li navçeya Idlibê çend grûpên Îslamî yên terorîst şerê rejîmê dikin, di dema Kurd li Sûriyê bûne qurbaniyên nakokiyên Tirkiye û Sûriyê, her wiha qurbaniyên hev têgihiştinên siyasî ku ew ji Amerîkayê re ne mijareke pêşînî ne."

Ji aliyê xwe ve, nûnerê taybet ê Neteweyên Yekbûyî bo dosyeya Sûriyê Gier Pedersen dibêje, niha



derfeteke mezin ji bo Sûriyê çêbûye, divê hemû alî bi hev re bi rêya proseya pêngav bi pêngav krîza vî welatî çareser bikin.

# Azadî çiye?



N: Sara Mukerem

Gelek caran mirov ji xwe pirs dike gelo ma qey mirov dikare azadiyê bi dest ve bîne an jî bibîne, gelo di gerdûnê de hebûna mirov û berxwedan bixwe azadiye?

Çima ewqas azadî ji me re bitaybet ji gelê Kurd re girîng e?

Em vê yekê baş dizanin ku berî her tiştî dijmin, netenê axa me, belkû çand û zimanê me jî dagîrkiriye, lewma dema em dibêjin em hene û em basa hebûnê dikin, tê vê wateyê ku ne hebûn bi bê azadî dibe, û ne jî azadî bi bê hebûnê dibe.

Anku em nikarin çanda tunekirin û qirkirinê bipejrînin, ji ber vê jî tişta herî rast tekoşîn û berxwedan e. Wateya hevoka azadiyê pir berfirehe, û azadiya civak û jinê bingeha azadiya hemû azadiyan e. Lewma, ger civak azad nebe jin jî azad nabe û vê civak di jiyaneke şaş de bijî. Çi tişt biqasî azadî û rûmetê girîng nine, her ji ber vê yekê ye gelê Kurd û jina Kurd ev heyama çend salan e ji bona azadî û rûmeta xwe tekoşîn dikin û nirxên bê hema di vê rê de dane.

Her di virde dixwazim destnîşn bikim, ku peyva azadiyê peyveke pir bi wateye û bi jiyan û hebûna mirovahiyê ve girêdayî ye.

Azadî feraseteke ku mafê tevahiya vê cîhanê ye, gelek caran dijminên me yên xwînmij xastine serweriya xwe li ser me bidin sepandin. Bi kuştin û bidarvekirin û hepskirina keç û xortên me yên leheng, xastine bi fîzîkî bixe di nav qefesan de.

Lê bi baweriya min azadî di kêliyên piçûk de veşartiye û her ji ber vê yekê jî ji dema ku şoreşa Jin, Jiyan, Azadiyê destpê kiriye, gelê me bi hizr û baweriya îradeya azad singê xwe ji guleyên dijimin re kirine mertal û serî netewandine, ev yeka jî tê wateya heman azadiyê.

Di rastiyê de, niha em di Rojhilatê Kurdistanê de bi pêşengiya jinan di demên azadiyê de dijîn. Ji berku ev berxwedana ku niha li Rojhilatê Kurdistanê ye, berxwedaneke dîrokî ye.

Di sedsala 21`an de vê bi şoreşa jinê jiyana azad ava bibe, helbet ev silogana Jin, Jiyan, Azadî, bitaybet ji bona jinan, mijareke siyasî û exlaqî ye. Her ji ber vê yekê ye ku ev heqîqeta ku heye em nikarin nedîtî bigrin.

Mijara azadiyê bo her netewe an aliyekê pir girînge û ji ber ku azadî nebe mirov nikare bijî, ji ber hindê jî her netewe an alî û an jî mirovek ku zilm lê hatiye kirin, an bindest e an jî kole ye, dibe bo rizagirbûn û serbestiya xwe bi hemû awayî tekoşînê bike, her di vê barê de jî rêberê şehîd, Dr.Ebdulrehman Qasimlo Sekreterê berê yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê gotiye:



Her neteweyek ku azadiyê bixwaze dibe nirxa vê jî bide.

Di dîroka Kurdistan û Rojhilata Navîn û mirovahiyê de, ev yekem care ku gel bi hevre dewra silogana jinê li dijî sîstema zilamsalariyê û hêzên desthildar serî hildidin. Gotina hevpar a Jin, Jiyan, Azadî, di roja me ya îro de tesbîteke dîrokiye û guheriye bi berxwedaniyeke gerdûnî. Sedema ku Jin, Jiyan, Azdî bûye berxwedaneke hevpar a her kesî, eve ku civak azadiya xwe di azadiya jinan de dibîne.

Ez dikarim bi misogerî bibêjim ku, şoreşa Jin, Jiyan, Azadî, vê bibe sembola azadiya tevahiya cîhanê.

Ji berku ev şoreş şoreşa jinê ye, û vê cîhan bi vê şoreş û tekoşîna jinê ya li Rojhilatê Kurdistanê, dîktatoriya biyoma zal li ser neteweya zilm lêkirî ya Kurd û neteweyên din yên bindest li Îranê, havêjin bo zibildana dîrokê û siya baskên azadiya jinê vê di seranserê cîhanê de deng vede û bibe xwedî pêgeh di her warî de.

# Li Zankoya Kirmaşanê xwendekarekê canê xwe ji dest da, malbata wê bi guman e


Xwendekareke Kurd di beşa navxwe ya zanîngeha Azad ya Kirmaşanê de canê xwe ji dest da. Malbata wê dibêjin mirina wê bi guman e û daxwaza lêkolînê li ser sedema mirina wê dikin.

Şeva Çarşemê, xwendekara pola duyem a hemşîretiyê li Zankoya Azadî ya Kirmaşanê Sena Zari ji nişka ve canê xwe ji dest da. Li gorî gotinên kesên nêzîkî wê:, Sena Zar`î ti nexweşiyeke wê nebûne û kesên ku pê re dimane jî ti nîşanên nexweşiyê li ser wê nedîtine û ji nişka ve xwîn ji poz û guhên wê hatiye û canê xwe ji dest daye.

Malbata Sena Zar`î guman dikin ku keça wan bi mirineke asayî miribe û bavê wê jî ji berpirsên beşa navxwe ya Zankoya Azadî ya Kirmaşanê re gotiye, keça wê hatiye kuştin û daxwaza lêkolînê li ser sedema mirina wê kiriye.

Serokê zanîngeha Azad ya Kirmaşanê Ferhad Gulmihemedî ragihand, pizîşkiya dadwerî lêkolîn li ser cenazeyê Sena Zari kiriye lê heta niha encam nehatiye ragihandin.

Sena Zari 21 salî bû ji gundê Kuîkê yê ser bi bajarê Serpêla Zehaw bû. Sala borî di beşa hemşîretî



ya zanîngeha Pizîşkî ya Kirmaşanê de hatibû qebûlkirin. Cenazeyê Sena Zari roja Pêncşemê li gundê Kuîk ê Serpêlî Zehaw hate veşartin.

# Siyaseta rejîma Îranê a qirkirina neteweyên bê maf, ne siyaseteke nû ye



N: Hesen Mukerem

Siyaseta qirkirin û jinavbirina neteweyên bin dest û bê maf yên Îranê ji aliyê rejîma Îslamî ya Îranê ve, ne siyaseteke nû ye. Jiber ku ev siyaseta li serdemên desthilatdariya Qacariyan, Sasaniyan, Madan, Eşkaniyan û Riza Xan de jî hebûye û niha jî Komara Îslamî wê siyaseta yek netewe û qirikirina neteweyên xeyrî Fars li Îranê de berdewam dike û ev siyaseta qirikirinê di her demekê de an li devra desthilatdariya paşayekê de bi curekê bûye, yanî di serdemên Madiyan, Hexamenişiyan, Eşkaniyan, Sasaniyan, û heta niha bi awayên cuda li ser netewan hatiye birêvebirin. Ev siyaset ku di esasê xwe de tenê qirkirin nine, belkû hewleke bo jinav birin, tune kirin, înkar kirin, helandin ku hemû dikevne çarçêveya asîmilasyonekê de ku bi dirêjiya dîrokê, desthilatên navendgera yên Îranê encam dane.

Guherîna navên bajarên weke Şabad û Arûn Ava û Îslam Ava Xerb û guhertina gelek navên din ên navçe û bajarên neteweyên bin dest, hewl dane wiha bi hemû awayî hizra yek netewe di Îranê de bidin sepandin. Her Paşa an desthilatdarekê bi kêfa xwe û bi birêvebirina vê siyaseta asîmilasyon û helandina neteweyên xeyrî Fars û guherîna demografiya herêmên wan netewan di Îranê de, hewl dane ku neteweya serdest li ser neteweyên din de bidin sepandin.

Ev siyaseta helandina bi armanca ji navbirina neteweyan û guherîna demografiya Kurdistan û herêmên din yên neteweyên din ên li Îranê weke Ereb, Belûç, Turkên Azerî, Turkemen, û yên din niha jî bi awayên cur bi cur ji aliyê desthilatdarên Îranê ve bi rê ve diçe.

Niha jî Komara Îslamî bi girtin, sirgûnkirin û kuştin û îdamkirina xortên neteweyên xeyrî Fars vê siyaseta qirkirinê birêve dibe.

Di dema niha de dibe ku bo gelek kes û aliyan ev pirsa çê bibe ku çima Komara Îslamî zêdetir hewl dide ji neteweyên bê maf îdam bike an heqaret, bêrêzîkirin û binpêkirina mafê mirovî di herêmên xery Fars de bimeşîne?

ji bo ku ev siyaseta nemrovane ya Komara Îslamî zêdetir û bi awayek zelaltir bê famkirin, dibe bas ji îdamkirinên bikom yên Farsan di heyama salên 60`î yanî destpêka desthilatdariya Komara Îslamî bikin, dema ku Komara Îslamî hat ser kar, xwe ti kiryarekî nemirovane neparast, yanî ji bilî vê ku li kolan û şeqaman de xelk qetlam dikir, di girtîgehan de jî bikom girtî îdam dikirin.

Bo mînak Nasir Mihaciranî lêkolînek li derbarê îdamiyên heyama salên 1360`î heta 1361`an encam daye û pêka vê lêkolînê texmîn kiriye ku zêdey 5 Hezar heta 10 Hezar girtiyên siyasî hatine îdamkirin. Herwisa çendîn lêkoler û saziyên mafê mirovî yên din, di vî warî de lêkolîn encam dane û her yek ji wan texmînên cuda hene.

Ev şopandina heta niha jî berdewam e û Saziya Navneteweyî jî hemû carê daxwaza agahiyên zêdetir dike, bona ku bikare Komara Îslamî li derheq wan cinayetan de bersivdar bike.

Ya ku em dibêjin Komara Îslamî çima siyaseta qirkirina neteweyên bin dest û dijberên xwe li destpêka desthilatdariya Axûndan de daye berahîka xwe û heta niha jî dişopîne, eva ye ku dixwaze heçî dengên dijberî xwe kip bike, bi siyaseta asimîlasyonê netewan tune bike, cehda sereke ya rejîmê bo encamdana wan cinayetan jî, parastina sîstema desthilata dîktatorane ya xwe û parastina yek neteweye, yek welat, yek ziman û yek Ala ye ku, ev yeka jî ji desthilatên berî xwe bi mîrat vergirtiye.

Di Demsala Havîna sala 1367`an de, piştî bidawîbûna şerê di navbera Îran û Îraqê de, di nebûna medyayên azad de, Ayetûla Xumeynî biryar da ku bi kerb û kîna xwe çarenivîsa girtiyên siyasî çareser bikin û çalakvanên mafê mirovî li derheq vê biryara Aleytula Xumeynî ji bona îdamkirina Hezaran girtiyên siyasî, dibêjin ku bi hezaran girtiyên bêpar li mafên mirovî di girtîgehên Îranê de hatin îdamkirin.

Her li ser vê esasî Saziya Lêborîna Navnetewî di sala 2020`an de di rapora salaneya xwe de îşare bi îdama 483 girtiyan kiriye ku bi berçavgirtina nifûsa welatên cîhanê, Îranê bilindtirîn pileya hejmara zêde ya îdaman heye.

Ev lêkolînên han nîşan didin ku Komara Îslamî niha jî baca van kiryarên xwe yên nemirovane di civatgeha cîhanê de dide û saziyên mafê mirovî li pey bersivdar kirina Komara Îslamî ne û ev bersivdana vê jî mesrefeke yekcar zêde bo Komara Îslamî û berpirsên vê heye.

Lewma, Berpirsên Komara Îslamî dema ku dîtin komkujkirin û îdamkirina neteweya serdest anku Farsan ku di



welat de li her biryarekê de pişkdar in, û nasname hene, wiha hikûmet rastî tengasiyên cîhanî dibe, lê neteweyên din ku rejîm înkara nasnama wan dike, ger bên îdamkirin jî, ewqas dengvedan tunabe, lewma niha hemû givaşên xwe xistine ser neteweyên bin dest .

Neteweya Belûç ji her tiştî li welat de bê par e heta hebûna nasnamê, tenê di heyama 11 rojan de zêdey 25 welatiyên Belûç îdamkirin û îdamkirina girtiyên siyasî yên Kurd jî gorî amarên sala 1400`an digel sala 1401`an ji sedî 64 zêde bûye û ev cinayetên Komara Îslamî di civaka cîhanî de û ji aliyên saziyên mafê mirovî ve dengvedan an bertekek wisa tunebû.

Rejîm jî baş dizane ku Neteweyên bê maf yên Îranê ji ber nebûna mafê netewî û siyasetên çewt yên rejîmê, dengvedanek wisa tunabe û di civakên cîhanî de pir bas jê nayên kirin û givaşên mafê mirovî li ser Îranê kêm dibin, niha bê tirs û du dilî girtiyên Kurd û Belûç û Ereb îdam dike û mesrefeke kêm jî bo desthilatdarên rejîmê heye û rastî bersivdanê jî nabin û ev siyaseta girtiye berahîka xwe.

Wiha Komara Îslamî ev siyaseta qirkirin û jinavbirina neteweyên bin dest ji hikûmetên berî xwe bi mîrat vergirtiy û berdewam dike.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Gazîkirina mamosta Madeh Keremî bo Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê

Mamoste Madeh Keremî, pêşnimêjê Înê yê gundê "Hoyê" yê bajarê Sinê bo Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê hat vexwendin.
Li gor gazînameya ku jê re hatiye, divê ev mamostayê Olî yê Kurd roja Yekşemê 31ê Banemerê li Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê amade be.

Roja Duşemî 26`ê Befranbara 1401`an, mamosta Madeh Keremî bo dadgeha bajarê Şûşe hatibû gazîkirin û karbidestên dadwerî ji vî mamostayê Olî yê Kurd re ragihandibû ku dosyeya wî bi tohmeta "propaganda dijî nizamê û piştevanîkirina ji xwenîşandanan", "têkdana hizra giştî û tevlîhevkirina ewlehiya giştî" bo Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê hatiye şandin".

## Sine; Mamoste Ebdulcebar Lotfî bo Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê hat vexwendin

Mamoste "Ebdulcebar Lotfî", pêşnmêjê Înê yê mizgefta Îrşad Cam`i ya Sinê, careke din bo Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a bajarê Hemedanê hat vexwendin.

Li gor gazînameya ku jê re hatiye, divê ev mamotayê Kurd roja Çarşemî 3ê Cozerdanê Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê amade bibe.

Di Sermawez a sala 1401`an de mamoste "Ebdulcebar Lotfî" ji bo piştgirîkirina serhildana şoreşgerî ya Jin, Jiyan, Azadî, bo Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê hatiy gazîkirin.

## Li bajarê Selas Bawecanî ji ber gulebarana hêzên leşkerî yên dewletê kolberek birîndar bû

Roja Pêncşemî 21ê Banemerê, kolberekî Kurd ê bi navê "Xalid Sedeqat" yê xelkê bajarê Selas Bawecanî ji aliyê hêzên leşkerî yên hikûmetê ve hat birîndarkirin.

Hêzên Leşkerî yên dewletê bi bêy hişyariya berê rasterast gule li vê Kolberê ya li nêzî rêya sereke ya Êzgile-Şêxselê reşandin.

Li gorî çavkaniyeke agehdar, ev kolber ji aliyê hêzên leşkerî yên hikûmetê ve hatiye gulebarankirin ku ti barel pê nebûye.

Di vê bûyerê de Kolber ji aliyê lingê xwe ve bi giranî birîndar bûye û ji bo çareseriya pizîşkî bo nexweşxaneya Mida`in a Tehranê hatiye veguhastin.

Rewşa giştî ya vî kolberî giran  hatiye ragihandin û roja Sêşemî 26ê Banemerê dê neştergerî bob ê encamp dan.

## Binçavkirina endamekî girûpa "Benar" a Avdanan ji aliyê hêzên ewlehiyê ve

Êvariya roja Yekşemî 24`ê Banemerê, "Mihemed Daniyalî" endamê girûpa hilbijaran a "Benar" a Avdananê ji aliyê hêzên ewlehiyê yên Dêhloranê ve hat binçavkirin.

Li gor çavkaniyeke agehdar ya Kurdapa, ev ciwanê temen 23 salî, bi bê nîşandana belgeya yasay ji aliyê hêzên ewlekarî ve hatiye binçavkirin û bo lêpirsînê bo navenda Îtilaata Îlamê hatiye veguhastin.

Vê çavkaniya agehdar got jî: "Daniyalî" ku xelkê Avdananê ye û ji bo kar çûbû Dêholaranê.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê, derbarê sedema binçavkirin û tohmetên li ser "Mihemed Daniyalî" de ti agahî nehatine bidestxistin.

## Mehabad; Ji xwenîşanderekî re cezayê heps û sirgûnê hat birîn

"Sohrab Avîzken", xwenîşanderê xelkê Mehabadê, ji aliyê dadgeha Şoreşa vî bajarî ve, bi Sê sal heps û sê sal sirgûnkirina bo bajarê Zencanê hat cezakirin.

Dadgehê ev welatî bi "komkirin û komploya têkbirina ewlehiya neteweyî" û "têkdana aramî û prensîpa giştî" tohmetbar kir.

Ev ceza di van rojên dawî de li girtîgeha Mehabadê ji bo "Avîzken" hatiye birîn.

"Sohrab Avîzken" di Sermaweza sala 1401'an de di dema serhildana şoreşgerî ya "Jin, Jiyan, Azadî" li Mehabadê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibû girtin û ji bo lêpirsînê birbûn bo yek ji navendên ewlehiyê yên Urmiyê.

Ev welatiyê han piştî lêpirsînê bo girtîgeha Mehabadê hatibû veguhastin.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (446)

## Wêneyên rêûresima Yadgeha nîştimanî ya Barzanî









